

## KEŞTIYA BAYÊ DI ASOYÊN KURMACIYA GEWR DE DI ÇIRÛSE

Selîm Temo, piştî ku bi Tirkî çend kitêbên helbestê nivîsîn, teveccuh dît, hate hez kirin, bi pesindayîn û xelatan hate taltîf kirin, di helbestnivîsandina Tirkî de “Jubile”ya xwe kir û dev ji nivîsandina helbestên bi Tirkî berda. Yekem dîwana wî ya helbestan a bi Kurmancî bi navê “Sê Deng” di sala 2011'an de di nav Weşanên Agora'yê de çap bûye. Piştî bêdengiyeke dirêj, par, di dawiya 2016'an de, dîwana wî ya duyemîn a helbestên Kurdî, “Keştiya Bayê” ji nav Weşanên Lîsê derket.

Keştiya Bayê, weke hun jî dizanin navê xwe ji beyteke şa'irê gewre Melayê Cizîrî distine:

*“Şevê zulmat û deryayê ji mewcan qet xeber nayê  
Şikestî keştiya bayê 'ecacê wê şefeq dayê”*

Bi saloxan navê kitêbê pêşî “Punga Li Dora Bajêr” bûye, lê dûre wekî nav di "Keştiya Bayê" de biryar hatî stendin. Keştiya Bayê cara 'ewil di “Hayat TV”de, di bernameya "Keçi Yolu" de hate xwendin û ji hingî ve ji aliyê gelek helbesthezan ve hate xwendin, ecibandin û par ve kirin.

Keştiya Bayê weke sê beşan û helbesteke xweser hatiye terxan kirin. Helbesta ku neketiye beşekê mirov dikare weke ‘prolog’ekê bixwîne. çawa pêşrevê Temo, Melayê Cizîrî di beyteke xwe de dibê: *“Ger lu'luê mensûrî ji nezmê tu dixwazî / Wer şî 'rên Mêlê bîn te bi Şîrazî çi hacet”* Selîm Temo jî di Kurdînivîsandinê de bibiryar e û teqez dike ku ew amade ye bo kurdînivîsandinê, lewma dibê:

(...)  
*Ez êdî amade me ey kurdî  
Min malîşt mêjiyê xewnê ji tengesebra sedsalan*  
(...)

**Beşa Ewil:** heft helbest bo kurê xwe [Cemşivan]: Hewlêr, Sinê, London, Tehran, Berlîn, Lahey, Roboskî..

**Beşa Duwem:** Stranên bo xwe.

**Beşa Dawî:** stranên şînê.

Kitêb herçend ji helbestên serbest pêk were jî, xuyaye Selîm Temo serê xwe bi wezn û ristsaziye (dizgi) re jî êşandiye. Ev yek ji aliyê dîtbariyê ve dike ku helbest bipîvan, xweşik û estetîk bêne xuya kirin.

Kitêb têra xwe ji helbesta klasîk sûd wergirtiye. Bi taybetî çi hacet, bo Melayê Cizîrî nazireyeke xweş e:

(...)  
*Bêje Temoyî tu bêje, beyt û xezel û gul bêj  
Ger siya Melayî hebit me bi rozê çi hacet*

Kitêb, bi giştî ji helbestên ciwan pêk tê. Bi taybetî beşa stranên şînê gelek gelek baş e. Heçkû Selim Temo dibe xwezî ev karesat û bobelat ne hatiba serê me û min ev helbest nenivîsandiba.

### **Hin hêmayên xweşik ji kitêbê:**

*esmanê kor (r.11); navtenga demê (r.12); keleha cotmehê(r.15); çirûskên kedîkirî (r.17); siya xewnerojkan (r.25); siya melayî [cizîrî] (r.29); artêşa kumsor (r.31); şimamoka dardakirî xemgîn (r.42); kirmanckiya xwe yafîreh (r.42); banga strizerka (r.65).*

### **Ji Keştiya Bayê çend riste:**

*ew ên ku ew çiyayên xwe bûn (rp.34)*

*kulmalê mala xwe me, salixdanê çîroka xwe me ku wa ji bîr diki li deverekê (r.45)*

*bizanibe dilê min bar e li ser dilê min (r.44)*

*ax ku kurdîni nîfira sedsala zikreş bû êdî (r.44)*

### **Bi nîyeta encamê:**

Me gelek qîz û xortên xwe yên ciwan, di bihara ‘emir de spartine axa sar. Em li ber wan dikevin, em dikesirin, em dihezinin, em hestiyar dibin lê berketin û hezna helbestkaran tîrtir û cûdatir e elbet. Lewra Temo, weke dewrêşekî axirzeman, weke dengbêjekî modern derdikeve pêş û çawa heq dikin dibe berketî û şîngirê wan ternalên bêmirad, hezna wan dikşîne û li pey bîranîna wan î ezîz zêmaran distirîne:

(...)

*Kulîlka merisî bû, kur bû, bira bû, bexê koza bavê xwe bû  
ax ku nîne starek ji şîna Civanê min zêdetir; îro xwe spartiyê avê!*

Keştiya Bayê ya ku di Asoya Kurmaciya Gewr de di çirûse, bi ya min yek ji baştirîn kitêbên helbestan yên van salên dawiyê ye. Belkî jî ya herî baş be.

*\*Selim Temo, Keştiya Bayê, Lîs, 2016. 72 rp. 10 Lîra.*

**Mewlûd OGUZ**

**oguzmevlut@gmail.com**